

# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD



1/84



## NAVEROK

Çend Gotin.....	3
Casimê Celil Bû 75 salî.....	4
Hovitiyek Ji Rejima Iraqê...6	
Cografya Kurdistan.....	8
Apê Selim Çû Heqiya Xwe.10	
Kongra Federasyonê.....	12
Bername Mamosteyên	
Kurd.....	14
Kitebek	
"Li Ser Kurdan".....	19
Helbest.....	20
Pirtûkeke Nû.....	22



Berpirsiyar

S. FERMAN

Pergala Rûpelên

A. M. GILLY

Raxistina Nivîsaran

RÛŞEN

Redaksiyon

KEYXUSRO SÎPAN

BENGÎN BOTANÎ

A. M. GILLY

**B E R B A N G**

Kurdisk tidskrift, utges av  
Kurdiska Riksförbundet. Ansv-  
arig utgivare och Redaktör:  
S. Ferman. Layout: A.M. Gilly.  
Sättning: Rûşen.

**A D R E S S**

Kurdiska Riksförbundet,  
Tunnelgatan: 14, 3 tr.  
111 37 Stockholm/SWEDEN  
TEL : 08/ 11 23 42

Prenumeration: Medlemmar  
50.- kr/år. Övriga 100.-kr/år.  
Postgiro: 64 38 80-8

**XWENDEVANÊN HÊJA!**

Hêjmara yekem a Berbangê ya 1984 a hê nû di meha Gulanê de bi destê we dîkeve. Bîbûrî! Emê weke bîyarê Federasyonê ya Komita karger 12 hêjmarên Berbangê di nav 1984.an de derxî. Ji bo ku valahiyên 3 mehên bûri tji bibe, dê hin mehan de Berbang cote-cot derkeve.

Bila ji bir neçe, ku Berbang dê bi alikariya we derkeve. Em, alikariya ku ji 'sazgeha Biyanîyan li Swêd' (SIV)distinî tîri 4 hejmarên nake (postekirî, mizampaj, daktilo û hwd. tî de.

Alikari û mafê salewexti bila bi ser hesabê postgiroya federsyonê bê, û tim navê Federasyonê bi Swêdi were nivîsandin weke "Kurdiska Riksförbundet" Vê yekê karê perekişandinê hêsan tîr dîke.

serketin û xweşî ji we re!

**B E R B A N G**

Kovara Kurdi, Xwedî : Fed-  
erasyonê Komelên Kurdistanê  
li Swêd. Buha : 5 Kron, Abo-  
na salekê: 50 Kron, 30 DM.

**N A V N I Ş A N**

Berbang, Tunnelgatan 14,3 tr.  
111 37 Stockholm/ Sweden.  
Tel : 08 / 11 23 42.  
Postgiro : 64 38 80-8

*S. ferman*

Berbang heta nuha bi tipên latini û pirani bi zaravayê kurmanci hat weşandin. kêm be ji zaravayên zazaki û kurmanciya jêrin (sorani), di rûpelên Berbangê de cih girtin. Emê vê yekê di hejmarên dahati de ji bîdominîn. Armanca me, parastina yekitiya nivisandi ya zîmanê kurdi ye.

Tê zanin ku bi taybeti zaravayê zazaki gelek kêm hatiye nivisandin. Kesên ku nuha bi zazaki dinivisin, dixwazin vê zaravayê raxin meydanê ku dîr-nê zîk-bûna zaravayên kurdi zelaltir bibe. Vê yekê mirov ji bo sorani ji dikare bîbêje. Çi heye di nivisandina Berbangê da me kêmasiyê xwe ranekir.

Ev 'kumika' bi nav û deng bûye sedemekê nelhevkirî. Em dixwazin, kû ji alî nivisandin va Berbang yekreng be, ne carna 'i' ya bê kumik, carna ji 'î' bi kumik be. Di hem û rûpelên Berbangê da tipên 'i' bi kar bînin, kumik ji ser 'i' bi carek va rabe. Lê belê, hin niviskarên me yê n derva kumik kirine şert. Dîbêjin: "tipên ku Mir Celadet tespîtkirine dê neyên guhartin. Ger guhartina, weke kumik ji ser 'i' bê avêtin zîmanê kurdi xera dibe, dibe zîmanê tirki."

Divaye ji bir neçe, pêwîstbe dê tişt ji wern guhartin. Tespîten Mir Celadet ne weki Kuran e. Dr. Nurettin Zaza, di pêşgotina berhevoka kovarên Hawarê de dibêje: wextê Mir Celadet li ser tipên kurdi kardikir, tim bir û baweriyên hevalên xwe dipirsîya. Bi xwestina hevalên wi çend tip ji hatibûn guhartin. Herweki 'K' û 'q'

Disa ew hevalên me dibêjin: 'Hun bi vi awayi dengê kurdi xera dikin. Ger kumik li ser 'i' tunebe ev deng dibe tirki'

Beriya her tiştî, tip deng çêna

kin, mirov ji deng tipê dîke. Swêdiyan berê di cihê 'av' de 'af' dinivisandin. Nuha wê di nivisandina ji kirine 'av'. Disa Swêdi gelek guhartinên di çêkirine. Îngiliz, ji bo dengê tenê çend tipan bi hevra dinivisîn

Ger em hinek guhdarê hev bin ez bawerim mirov dê hevdu hêsantir fêhm bike. Li Kurdistana Tirkîyê 10 milyon zêdetir kurd dijîn. Ew bi tirki dixwin û tipên 'i' di serê wan de cih girtiye. Evaya rastiyeke. Divaye em, ve yekê binasin. Xwendina kurdi li Kurdistana Tirkîyê, di deh salên dawî de bi van tipan pêk hat ji ber ku kovar û rojnameyên kurdi, wê çaxê bi mîrxasi hat çap û belavkirin. Xwandina kurdi hêsantir belav bû.

Nivisandina kurdi bi tipên latini di nav kurda de ji 1970 vîrda hê nû belav dibe. Li Kurdistana Iraq û Îranê tipên erebi bi kar tên. Tenê li Kurdistana Sûriyê kêm be ji bi tipên latini tê nivisandin.


Mînin li ser wê meselê dîrdîrê rawestim. Em dixwazin li ser van pîrsan û yê n din-rabezîrînen dîr-dîrê ji alî xwendevanên Berbangê bînin çêkirin.

Di hejmarên çûyî de li ser pîrsa nivisandina zîmanê kurdi çend nivis hatî bû belavkirin. Em dixwazin vê yekê bîdominîn.

Di nav hewqas zulm û zordestiyê de zîmanê kurdi hêji bi xurti diji. Bîngeha nivisandina kurdi ya bi latini, ji alî birewerê kurdi Mir Celadet hatiye avêtin. Ew pêşta birin, siviktirkirin barê me ye. Ji bo vê yekê rûpelên Berbangê, ji her ditin û xebatê ra amade ye.

ji bo Berbangeke xurt. Bîminin di xweşiyê de.

**ÇEND  
GOTIN**



## CASIMÊ CELİL

### BÛ 75 SALÎ

CASIMÊ CELİL HELBESTVANÊKI KURDÊN SOVYETÛSTANÊ YÊ BI NAV Û DENGÊ. DIRÊJAHÛYA JÛYÛNA WÛ GÛHÛSTÊ 75 SALAN. JÛ WAN SALÊN JÛYÛNA XWE EW, NÊZÛKÛ 55 SALAN DÛYARÛ PARASTÛN, PÊŞVAÇÛN Û DEWLEMEND-KÛRÛNA ÇAND Û LÛTERATÛRA KURDÊN SOVYETÊ KÛRÛYE. Û ÎRO JÛ HELBESTVANÊ BERÊZ WÛ KARÊ GÛRÛNG Û ZÛMET WEK GELEK HELBESTVAN Û HOZANVANÊN KURDÊN SOVYET ÊN NAVDAR Û ZANE LI SER MILÊN XWE BI SERBÛLÛNDÛ DÛMEŞÛNE.

HELBESTÊN CASIMÊ CELÛL, LI SER BÛYERÊN WELAT Û ÇÛHANÊ, LI SER ROJ Û REWŞA KURDÊN SOVYETÊ, LI SER LENÛNÊ NEMÛRÛ Û DOSTANÛYA GELANE, LI SER BABETÊN DÛROKÛ Û DÛL Û DELALAN E...

DI VAN PÊLAN DA LI BAJARÊ EREVANÊ JÛ BO 75 SALÛYA CASIMÊ CELÛL CIVÛNEKE MEZÛN HAT PÛROZKÛRÛN.

JÛ BO VÊ YEKÊ ROJNAME 'RÛYA TEZE' BI GOTARA ROJNAMEVANÊ XWE PRÛSKÊ HOYÛ LI SER HELBESTVAN CASIMÊ CELÛL DENG KÛR.

EM LI JÊR WÊ GOTARÊ BI TIPÊN LATÛNÛ RABERÊ XWENDEVANÊN XWE DÛKÛN.



# Êvariya Qedirgirtinê

*Priskê Mhoyi*

Navê şayir û xebatçiyê mexlûqetiyê Casimê Celil, sazkirin û pêştaçûyina litêratûra û kûltûra kurdaye sovêtiyêra girêdaye. Ew endameki wê sîlsîleta şayir û nviskarêd meye pêşne, ku kevîrê himê litêratûra kurdaye sovêtiyê dani û bî xwe ji bû sazîreki wê.

Hêla salê d 30-da efrandinêd Casimê Celil xwexwetîye pêşîn û teremêd wi gazêta Riya Teze da hatne çapkirinê. Wan sala efrandinêd wi berevokêd efrandinêd şayir û nviskarêd kurdêd sovêtiêda çiki berbiçev dîgrîn. Ewi bî xwe çend berevokêd usa dane hazîrkirinê û neşîrkirinê, gelek cara jî rêdaktori lî wana kirîye. Şayir wan sala usa jî prêsa (weşana) rêspûblikaêda bî aktîvi (çalaki) pêşda tê. Jî efrandinêd şayirê ermeniayi nav û deng Hovhannês Tûmnyan, şîer, çîrok û serhatiêd Pûşkinê mezin teremeyi kurdi dîke û bî ktêbêd başçe çap dîke. Wê yekêra tewayi ew usa jî berevokêd efrandinêd şayirêd kurda hazîr dîke û bî zmanê ermeni dîde neşîrkirinê.

Hetani nha gelek berevokêd efrandinêd Casimê Celil xwexwetîe derketine. Jî wan efrandîna êpêce bî zmanê ermeni, ûrsî, adrbêcanî û emae-têd welatêd derekeye cuda-

cuda (inglîsî, fransîzî, erebî) hatine tercîmekirinê. Sala 1954-a berevoka efrandinêd wiye bî navê Elegez bî zmanê ermeni ronayî dit. Salekê pey wêra disa ktêba wiye mayin Beyt-serhatiêd kurdaye hîrkîrinê bî zmanê ermeni hate çapkirinê. Wêda ew efrandinêd zargotîna me bûn, ku şayir seçêkîrbûn. Sala 1957-a ktêba şîer û poêmêd wiye mayin Kanya dê- bî zmanê ermeni ronayî dit.

Salê d 60-da destpêkî berevokêd efrandinêd Casimê Celil tere -Rojê min-, -Ocaxa min- (bî terema zmanê ermeni), -Bî rêêd wede- (bî terema zmanê ûrsî), -Klamêd çya-, -Oda kurda-, -Kurdê bengî- û êd mayin çap bûne.

Nava efrandinêd xweda şayir bî zuhdarbuneka mezin emrê meyi îroyîni sazdarîe û mêrxasîe dostî û bratiya emae-têd sovêtiyêye qewin nişan daye û peşmandîye. Nava poêzia Casimê Celilda têma Lînîniê çiki berbiçev dîgre. Lê evîntî, tebiyet û hîzkîrîna berbî weten motîvêd (nmûnê n, navnişanê n) efrandinêd wiye himline.

Şuxulvaniya xweyê efrandari-êra tewayi Casimê Celil usa jî xebata mexlûqetîe kirîye ,

bûye serwerê para radioxeberdanêd kurdi ya komîtea Ermenîstanêye radioê û dîrdîtinokêye dewletê, salêd dirêj neşîreta Ermenîstanêye dewletêda redaktorê literatûra kurdi bête.

Derheqa emekê Casimê Celilê mezînda dî suxulê pêşdabîrînê dewlemedkîrîna litêratûra û kûltûra meye, hazîrkîrîna ktêbêd kurdaye bedewetîe û dersada wê êvariya da hate gotîne, ku çendeki pêşda bona 75 salîya bûyîna şayir lî sera mala nviskarêd Ermenîstanê derbas bête. Wextê êvariya Hîbelyaniê (sersalîe) kîjan serwertîya tfaqa nviskarêd tanê ûseksiya (para, beşê) rêd kurda dabûne teşkîlkîrinê, şayir û nviskarêd ermeni û kurd wekilêd întelîgensîya me, xwendekar berev bûbûn.

Êvari katîbê serwertîya tfaqa nviskarêd Ermenîstanê, nviskar Mkrtîç Sarkîsyân bî xebra Siftêva vekîr.

Derheqa emrê û şuxulvaniya şayirê efrandîrîe û mexlûqetîe da nviskar Wezîrê Eşo daklad xwend.

Êvariya qedîrgirtînêda sedrê sêksîa nviskarêd kurda, şayir Karlêne Çaçanî, dîrêktorê (serokê) neşîreta -Hayastan-ê Hrant Gazaryan, serwerê para radioxeberdanêd kurdi Ahmedê Gogê, xwendkarê fakûltêta ûnivêrsîte ta Ervânêye dewletêye hazîrkîrinê (amadekîrinê), bajarvanê jî Sûriaê Ecemê Dewrêş pêşda hatî, şayir bî alavî bîmbarekkîrînê emekê wiye mezin dane kîvşê dî suxulê pêşda birîna kûltûra kurdaye sovêtiyêye mletîe da.

Paşê şayir Casimê Celil xebarda. Ewi razîbûna (spasîya) xweyê bî dil da xebardaya û hazîra bona qedîrgirtînê û bî layîqî qîmetkîrîna emekê wi.



# HOVITYEK JI REJIMA IRAQÊ

Rejima Iraqê hovitiya xwe li dervayê welat ji pêktine. Tê zanin ku heta nuha gelek kesên dij rejimê û pêşverû li derva hatibûn kuştin. Sefaretxaneyên derva weke şebekeyek mefîa dixebite, dîkuje, tehdit dike... Vê dawiyê di sala 1983yan da xebata wan a spioni li Swêd ji ali polisê Swêd va hat eşkere kirin. Disa di 17 Adara 1984 da Diplomatê Iraqê Gaib Hassan, li Stockholmê bi demançeyê xwe va di meydana kunstradgarden da êrişê xorteki kurd kir. Polisê Swêd di cih de demançaya wi ya Smith Wesson jê girt.

Hemû rojnameyên Swêdi yê rojin li der vê êrişê hov nivis belavkirin. Bî rasti ji, mirov çiqas bixwasta nikaribû hovitiya rejima Iraqê hawqas bida nasin. Ew xwe bixwe xweş eşkere kirin. Li goreyi şefê polis ya beşa adli Jan Varnhall: Cara yekeme ku wesiqyaya silehê diplomatek jê tê girtin. Her usa cara yekeme ku diplomatek bi vi awayi bi silehê êrişî kesek dike.

Li goreyê qanûnê, sefir u hevalên wî tenê dikarin sileha xwe di nav sînorê sefaretxaneyê da

bi kar binin. Lê nikarin sileha xwe li derva bixwera bigerin. Ew çax sileh ji wan tê girtin. Çi mixabin bi sedema diplomatbûyînê, tedbirên din nayên girtin. Ji welat derxistin ji biryara hukumatê pêwîst dike. Di rojnama Dagens Nyheter da 23 Adar 1984 bi sedema vê hadisê li ser hêjmarê silehên sefaretxanê listeyek hat weşandin. Ji 39 sefaretxanan, silehên heri zêde li ba Iraqîyan (24-28 demançe û tîfing) û Emerikiya (17 demançe - revolv, tîfing) ye.

## 473 vapenlicenser på ambassaderna Poliskritik mot missbruk

På de utländska ambassaderna i landet toppar Iraks, Turkiets och USA:s diplomater listan över antalet beviljade vapenlicenser. De flesta gäller revolverar och pistoler för personskydd - men även jaktgevär används flitigt av ambassadfolk.

Dagens Nyheter kan här presentera den lista över diplomaternas vapenlicenser som utrikesdepartementet begärt att få av polisen.

Samma lag 473 vapenlicenser för utländska ambassadpersonal har utdelats och finns registrerade på Stockholmspolisens juridiska avdelning som skapar tillståndsbrev gällande vapen.

Men hur många av dem som är aktuella är oklart. Av de närmare 500 licenserna har knappt 200 beviljats efter 1975.

Omsättningen är stor bland ambassadfolk. Polisen i Stockholm licenst.

Många sköter inte avsevärt utrustningen av licenserna när de licenser lämnar, säger Sven Ortenberg, chef för tillståndsdokumentation.

USA har 11 licenser. Förutom vapenlicenser för personskydd har amerikanska rådgivare jaktgevär. Sjögrens ambassad i Stockholm har licens för bara ett vapen - en stadsrevolver för jaktändamål.

De har säkert många fler, men har inte uppgett det, säger man hos polisen.

En ambassad kan i princip ha hur många vapen som helst inom ambassadområdet utan att svenska myndigheter kan lägga riktlinjer till det.

Men så fort vapnen avses att bäras med utomför ambassadområdet måste diplomaterna ha licenser.

Smith & Wesson - ett mycket populärt märke bland ambassadfolk - mot amerikanska demonstrationer.

Iraks diplomater har sammanlagt 24 licenser - alla gäller revolverar och pistoler.

Av dem kan nästan 17 eller 18 licenser kvar i landet utom polisen.

Turkiet har licens för 18 vapen. Det är främst revolverar och pistoler, men även ett par jaktgevär.

USA har 11 licenser. Förutom vapenlicenser för personskydd har amerikanska rådgivare jaktgevär.

Sjögrens ambassad i Stockholm har licens för bara ett vapen - en stadsrevolver för jaktändamål.

De har säkert många fler, men har inte uppgett det, säger man hos polisen.

En ambassad kan i princip ha hur många vapen som helst inom ambassadområdet utan att svenska myndigheter kan lägga riktlinjer till det.


Men så fort vapnen avses att bäras med utomför ambassadområdet måste diplomaterna ha licenser.

USA har 11 licenser. Förutom vapenlicenser för personskydd har amerikanska rådgivare jaktgevär.

Sjögrens ambassad i Stockholm har licens för bara ett vapen - en stadsrevolver för jaktändamål.

De har säkert många fler, men har inte uppgett det, säger man hos polisen.

En ambassad kan i princip ha hur många vapen som helst inom ambassadområdet utan att svenska myndigheter kan lägga riktlinjer till det.



Den irakiske diplomaten Gaib Hassan vapenlicens har dragits in av Stockholmspolisen. Hassan hade dragit sin pistol under en demonstration. Irak toppar listan över antalet beviljade vapenlicenser för ambassadtjänstemän - 24 av totalt 473 licenser.

## Irakdiplomaten förlorar licensen

Den irakiske diplomaten Gaib Hassan fick på torsdagen licensen för sin pistol indragen. Beslutet fattades av polismästare Hans Holmér i Stockholm. Det är första gången en utländsk ambassadtjänstemän får sin vapenlicens indragen.

Förutom att vapenlicensen för Hassans pistol av märket Smith & Wesson dragits in har tillståndet i Kungälvsparken i lördags blivit en regeringsfälla. Den irakiske diplomaten kräver att utvisas om regeringen bedömer hans handlande som olämpligt.

Hassan drog, som DN tidigare berättat, sitt vapen mot en motståndare till regimen i Irak. Polisövermannen konstaterade dock ingen skottlossning uppstått.

Polismästarens motivering till att återkalla vapenlicensen är att mannen visat sig olämplig att inneha vapen.

Det är dock frist fram för honom att använda sin pistol hur mycket han vill inom Iraks ambassadområde. Men bör han vapnet på ny på stan beviljas det. Han kan dock inte ställas till ansvar för olaga vapenlicenshan på grund av sin diplomatiska immunitet.

Dagens Nyheter följde på torsdagen få en kommentar från ROLF STENGÅRD


Hassan eller någon annan befäringshavare på Iraks ambassad. Ingen ville dock bli närmare siffran.

Utländska representanter ska följa världens lagar. Det som går omkring med vapen ska ha tillstånd, säger Jan Varnhall, chef för polisens juridiska avdelning som handlar licensfrågorna.

Enligt Varnhall är det första gången i historien som en utländsk diplomat förlorar sin vapenlicens i Sverige.

Men jag tror också att det är första gången en diplomat dras vappet i Sverige, säger Jan Varnhall.

ROLF STENGÅRD




Smith & Wessons pistoler och revolverar är de mest populära vapnen bland ambassadfolk. Men polisen är mycket misstänksam vad gäller diplomaternas skötsel av vapenlicenser.



# COGRAFYA

# KURDISTAN

"EV NIVISARA CIGERXWIN KU  
LI SER COGRAFYA KURDISTAN  
HATIYE NIVISIN, BEŞÊ DUWEM E.  
BEŞE YEKEM DI B E R B A N G  
HEJMAR 14' AN DE DERKETIBÛ."



*Cigerawin*

2- KURD DI BIN DESTÊ RÛSYA  
DE.

Kurd di Erîvande, di wan hindamên, ko dighêne Erarat de rûniştine weharenge di hin hindamên dijî de rûniştine weke: Erdehan, Qazimn, Qars de cî girtine û ji bil van cihan jî, kurd di hindama Zengezor, Ciwan şîr/Areş, Cibrîl/û hindama Elîzabêtpol/ de jî rûniştine. û divê, em bidin zânîn, ko kurdên van hindaman di hejmara paşî de, bi navê kurd nehatine jimartin.

Di sala 1910 de jimara kurd tevî Qarsê 125 hezar mirov bûn, ji wan 25 hezar, Êzîdî bûn.

AWÏREK: Mînoriskî jimara kurdên/Elîzabetpol/ nedaye xuyakirin û di îro de em nizanin ka çend hezar mirovin. û Qars di wê çaxê de weke, ko tê xuyakirin, gereke di bin destê turkya de bî, lê nizanîm çima li ser Erîvan jimartiye. Ji ber ko di şerê mezinî pêşî de şerên giran di navbera leşkerên kurd, turk û ermen, rûs de, li ser Qars û Erdehan, li Hesênqela çêbû ne û bîzor ketine bin destê rûsa û Ermena û kurd jê reviyane. Lê piştî şorişa Oktobera mezin leşkerê rûs ya xwe kişandiye û carekê di kurdên ko ji ber mirinê mabûn vegehiyane cihê xwe.

### 3- KURD DÎ WELATÊ FARIS DE

Kurd di hemî hindamên Karmanşah de û di Kurdistan û Gawris-Garûs û hin ji Azerbaycan û hemî hindamên Sawciblaq-Mehabad û rojava yê çemê Tataw û li ser xêzeke dirêj hawîr sînorê turkiya û hindamên rajorên Ormiye, Selmas, Xoy, Mako, de rûniştîne.

Kurdên îranê ji kevnarên cîgirên hindamên rajêrin û bawer dikim ko ji neviyên Madên kevnarene ko di rojavayê îrande rûniştîbûn, lê ew kurdên ko di kevin hindamên rojêrê rojhilatê îran ko di ol û zarên xwe de neweke kurdên mayîne, he mî ji koka xwe de yekin û ew bixwe bawer dikin û dibêjin: Em tev kurdin û yek miletin.

Lê ewên, ko li rajorê îran cîgirtine, gereke em zanibin, ko ji wan re ermena digot: kurçiya - Kurdistan ko îro jêre dibêjin Selmas û di wê çaxê de hindameke serbixwe dihate jimartin.

Lê ew hindamên rajêrê gola Ormiye, kurd piştî vî çaxî lê rûniştîne û di hindama Sawciblaq de heta îro jî hêj navên turkî tene xuyakirin:

AWÏREK: Eger binava bî, Kur

distan bicarek winda dibî, jiber ko di îro de em dibênin ev milletên raserê me Turk, Faris, Ereb ne tenê navên gund û hindaman, belkî jî, navên mirovan, malbatan jî, winda dikin û navên tirkî, farisî, erebî li me û malbat û hindamên welatê me dikin û nema em jî xwe nas dikin.

çend şêwe-Zaran hatiye perçekirin, weha renga jîndariya wan cıvaki dide zanîn ko bi xwe Kurdin û ola wan (Elî-îlahî) hin kurdên di jî pê bawer dikin .

Her wekû cara pêşîne ko dewleta (Osmanî) navê Kurdistan li hindama (Dêrîm) hatiye kirin û kengî navê Kurdistan dihat, daxwaz jê (Dêrsîs) bû li şerefnama Bedlîsî binerin !

Her wekû Bedlîsî derebegiya Dêrsim ji mezintirîne derebegiyên Kurdistanê dihejmêrî, lê newek heviya olperestî di çaxê Sefewiyana de ketiye vê hindamê û dijminên kurd her-gav dixwestin û niha jî dixwazin ko me berdî hev û bi hêsanî karibin malê me-welatê me bixun û di bin destê xwe de bihêlin. C.X.

Mînorûskî dibêje: hejmara kurd di hindama (Helebê) de ji hejmara Ereb kêmtire, ew nivîsarê ko Qunsilosê rûsî li Heleb dibêje ji 126.000 hezar mirovên ko di hindama Heleb de rûniştîne 10.000 gund kurdin, lê nedaye xuyakirin ka çend hezar mirovin û Mînorûskî pêde diçe û dibêje:

Belam li welatê Sêwasê kurd hindikin-hezar mirov hene, ev jî li ser gotina Qunsilos (Savînof) hatiye danîn.

Lê di welatê (Erzerom) de û bêtir di perçên jêrîn û rojhilat de Kurd bi pirîtî tede rûniştîne, Kurd 300.000 û Ermen 200.000 û turk 110.000 hezarin, ev jî li ser gotina Qunsilosê rûsî (Ademof) hatiye.

Li Bayezîd Kurd pênc-caran ji biyaniyan bêtirin (Lîç) û hin derebegên Kurdan li Sûriya ne bi ser hev peyda dibin, ko li hawîr Çiyayê (Dimişqin) û di nav bajêr de jî hin taxên kurd peyda dibin. (M.Hartîman).

Weke: (Salihiye), (Heyyekrad), (Sûq Sarûce), (Qeymeriye) û hin malbatên weke: (Eyûbî), (Kurdelf), (Zirikî) (Kurd Mîsto), (Talatî), (Dalatî) û li Bexda (Zengen), (Delû)... Hin di jî li hin dama rojhilatê riya Bexda- Iran rûniştîne. Qunsilos (Derelef).

Jimara tevayîya Kurdên Turkiya nêzîkî 700.000 mirov heye. Ca eger em kurdên (Faris) bi nêzîkî milyonekê bihejmêrin, jimara Kurd bi tevayî û bi awakî goman û texmîn ko kurdên (Rûsya) jî di ser dabin nêzîkî du (2) milyon heta sê milyon û nîv Kurd hene, lê Dektor (Xeznedar) li jêrê (hamiş) jimar (1) dibêjî:

Bê gomane, ko ev jimar ne bi rast û ronî hatine gotin û tişteke nîne ko xwe pê bigrin, belkî ji tehmîn û goman dernekevî.

Gotina Dektor gelek rast hatiye, ji ber ko kurdên di nav Turkiya de di nav dewleta Osmanî de bêtir ji Kurdên bin destê Iran de 12 derebegên Kurdistanê di bin destê Osmanîyan de bûn.

Weke: (Dêris, Zirikî, Hesênkêf, Silîva, Cizîre, Xerzan Sason, Bedlîs, Hekarî, Behdînan, Soran, Dimbilan) û hin di jî hebûn. C.X.

Herwakû tarîxên sedên 3-4-5 yê ko qoçî didin xuyakirin ko turkên-Selcoqî û turkên kolên Selcoqiyana bi zor welatê Azerbaycan ji dewleta kurdî-Rewadî-Salarî sitandine û heta bajarê Erdebîl di bin destê vê dewleta dewleta-kurdî de bû û her weha li pey hev malbatên: Qecarî, Sefewî, turkeman ki-



şandine Azerbaycan, lê mi-  
letê kurd bi gernasî li ber  
xwe daye û heta ko Meraxa  
tenê di bin destê Wan de  
maye jî xwe nedane bin des-  
tê Turkemana.

Mînorûskî dibêje: heta ni-  
ha ji tarîxbêjên kurd jî  
dibêjin: ko kurdên - Mukrî  
di çaxê dewleta Aqqûnlû û  
Qereqûnlû de yanî di sedê  
II yazdehê zayîn de hati-  
ne vê hindamê.

Ji van hindamên ko me go-  
tin hindamên sade-kurd, pê-  
ve jî hin Derebegî yên kur-  
dî di hindama Faris de pey-  
da dibin weke: Şadilî û lî  
hindama rajorê Qezwîn, Em-  
berlû û li hêla Şîraz, Ka-  
lûn-Ebdo peyda dibin ko Na-  
dirşah ew di sala 1736-1747  
de bi zor birine van hin-  
daman.

Lê kurê Belxî û Estexerî û  
Mesûdî dibêjin: leşkerê İs-  
lamê hêj neketibû welatê  
Faris hebûn, lê kurê Belxî  
tenê dibêje: leşkerên E-  
rebên misilman ew hemî kuş-  
tin û Ediddewle ev kurd  
anîne vî welatî.

Mînorûskî dibêje: bi awakî  
bingehîn Kurd di welatê Mû-  
sil de rûniştî bûn û hinda-  
ma Mûsil hindameke sade  
kurdiye, lê di îro de bi  
zor kirine hindameke Ere-  
b û hin Eşîrên Ereben koçer  
weke: Şemer-Cibûr û hin dî  
jî tede bi cîkirine û heta

kurdên Şengal û Şêxa û Ger-  
gerî û Hasinan ko ji kev-  
narede xelkên van hindaman  
bûn ji cî rakirine hinda-  
mên welatê Ere- û Ere- xis-  
tine şûna wa.

Mînorûskî dibêje: lê hinda-  
ma Wan, Bedlîs ji sedî 60-  
70 Ermen lê rûniştîne, lê  
hindama Hekarî ko heta sî-  
norê Faris dirêj dibe û hin  
hindamên Çiyayê Wan, Bedlîs  
pirên xelkên wan Kurdin û  
Eşîrên Nesterê dikevin jê-  
rê Hekarî/Colemêrg û hinda-  
meke teng û girtî, geliyê  
tiyarê de rûniştîne û di  
vê hindamê de ji sedî not  
ewin û hindam dibin destê  
wan de ye, lê ew jî di bin  
destê derebegê Hekarî de  
ne.

Lê di welatê Diyar-Bekir,  
Xerbûtê de Kurd ji hemî bi-  
yaniyan bêtirin Cizîra-Bo-  
tan ko dikeve welatê Diyar-  
Bekir li ser çemê Dicle la-  
nika milletê kurd-tê jimar-  
tin û kurd ji wir belav bû-  
ne û teygerên kurdperwerî  
ji wir derketine.

Lê heçîka welatê Xerbûte  
gereke em dabaşa kurdên  
(Dêrsim) bikin ko dikeve  
navbera herdû çetelên Çemê  
(Ferat) Kurd di virde bi 8  
cara jî ne kurdan bêtirin,  
bi zimanê kurdî mijûl di-  
bin, lê bi zarê (Zazayî) -

Dunbilî jî dipeyivin û ole-  
ke wan ne weke ola Kurd he-  
ye, ko jiber wilo hin mi-  
rov bawer dikin ko ne kur-  
din, lê ez bawer dikim ko  
ew awir ne di çî daye - ne  
raste, jiber ko bi zimanê  
kurd mijûl dibin,

Mînorûskî pêde diçe û di-  
bêje: Ewê ko di cara pêşîn  
de xwestiye ko Cugrafiya  
Kurdistanê li ser riwê ka-  
xetê bide nîşandan (Karîs-  
tisof e).

Lê bawer dikim ko dinav  
xelkên rojavade ne gelek  
navdare, yanî xelkê welatê  
rojawa wî baş nâsnakin û  
ne hêjaye ko em wê xerîtê  
di virde deynin ji bo hin  
tiştên tektîkî, ji lewra  
me xerîta (Mark Saykis) ko  
Kurdistanê bin destê Turki-  
ya dide xuyakirin, di vir-  
de bidin nîşandan ko ev  
(Mark Saykis) jî pêzanên  
herî mezine, ko di dabaşa  
Kurdan de bêtir kurdên bin  
destê Osmaniya, şareza û  
bîrewere.

Her wekû hin jimarê dijî  
li ser Ermen û Kurd û ji  
bil wan jî mijûl dibin û  
di nivîsarên wezaretê der-  
ve (Tojîna di Ermenistanê  
de) hatine belavkirin û di  
sala 1915 de hatine belav-  
kirin.


Lê nizanin çima ev jimarên  
han jî nedane xuyakirin û  
di virde ne nivîsîne..C.X.



# APÊ SELİM ÇÛ HEQIYA XWE

MIRIN, BÍRANÍNEK  
Û APÊ SELİM

Bengin Botani



1940.....

Apê Selim ( Mustafa Budak)

Apê Selim ji nav me bar kîr, çû. Ew çû dîlovaniya xwe. Êdi Apê Selim di nav refê hevalên xwe da tune, cihê wi vala ma, bî rasti cihê hevalê wek Apê Selim zû-zû nayê tîjîkîrîn.

Janeke zirav, nexweşîke gran lê peyda bîbû, êdi xelasi tune bû bedhal bû, doxtoran nîkarîbûn tu tîştêk bîkîrana, vê nexweşîya xîrab goşt, hesti û damarên canê wi kotîbû, kerî-kerî kîrîbû. Lê disa ji Apê Selim berxwe dîda. Wî zanîbû ewê bîmîre. Lê bîna wî gelek fireh bû, rûsar nîn bû, heta roja mîrînê ji, hêviya jîyînê, bawerîya xwe de dîparast, mîrîn tînê rûsar bû, dest avê tîbû pêsiira wî, bernedîda, mîrînê ew dîkşande berbî devê gorê. Lê Apê Selim kulmên xwe dîguvêşt xwe berevî serhev dîkîr, me-riyêk lî ber mîrînê ewqasi dîkare lî berxwe bîde. Dî dawiyê da, dî roja 30.04. 1984 an da lî

bajarê Stockholmê wî çavên xwe da hev, ket xeweke kûr, ji nav me bar kîr, çû ber rehma xwe.

Apê Selim welatparêzekî bî dîl şewat, Sosyalistekî bêhempa, mamostekî jêhati, dostekî gelek dîlovan bû, camêr bû, mêrxas bû, ew bî rasti hevalê rojên teng bû.

Ew şeng-şepal bû, rûken bû, gelek dîlnerm bû. Lî hemberî hêzên dijîmîn û kolonyalîstan gelek hîşk bû, hêrsa wî mezîn bû.

Ew tu wext bîlînd nedîfîriya, paqîjiya dîlê karker, gundî û belengazên Kurdistanê dî dîlê wî da hebû. Wî tu wext xwe ji pergal û fesala jîyînê dîr nedîxîst. Rojên tîrş-tal û tecrubeyên bî salan gelek tîşt hîni Apê Selim kîrîbûn. Jî ber veyekê hertîm, koma hevalên dora wî zêdeter

dîbûn. Ew dî warê berevkîrîna gel, hîşyarkîrîna karkeran gundîyan û bî rêvabîrîna karên politik da pîr jêhati bû.

Apê Selim, baş têgîştîbû, wekî Kurdistan tenê bî saya karên rêxîstîni û politik va dîkare azad bibe. Jî ber veyekê wî dî nav refên Partiya Sosyalîsta Kurdistanê Tîrkiyê (PSKT) cîh gîrt û bû endamê Komîta Merkezî. Lî Kurdistanê Tîrkiyê, dî warê berevkîrîna gel da, wî gelek karên rêxîstîni bî aktîfî anî cîh. Lî Kurdistanê Îranê, dî nav şerê germ da cîh gîrt, dî warê tekoşînê da karên mezîn, karên pîçûk negot, lî Îranê bî şev-roj xebîti, bû nefereki şoreşê.

Apê Selim, lî gundekî Derisîmê hate dînê. Malbata wî gelek xîzan û belengaz bû. Wî xwendîna xwe ya pêşîn lî gundekî cînar û xwendîna navîn ji,



li xerpûtê qedand.

Apê Selim, paşê bû mamoste. Li gelek cihan mamosteti kir. Ji ber ku hukmetên turk nedixwastin mamosteki kurd zêde li ciheki bimine, Apê Selim yek ji van bû, van hêzên kevneperest gelek caran beri wi dane, ajotîne, an ji girtine û avêtine girtigehê. Wi bi rasti rojekê rûyê rehetiyê nedit. Ser da ji 5 zarokên wi hebûn, ev çar salbûn zarokên xwe neditibû. Ji ber ku paşî cuntaya faşist di sala 1980 an da, ew mecbûr ma xwe veşêre.

Ew çû Kurdistanê Iranê demekê li wir ma, paşê derbasi Suriyê bû. Di dawiyê da ji bo tenduristiya nexweşiya xwe, ew hate Swêdê. Wi bi rasti ji durva zarokên xwe ra nameyên hinbûnê dişand, li ber dilê wan da

dihat, wi tenê digot bira zarhin bîbin, bîbin kesên camêr, rêke şaş da nemeşin. Ev bû daxwazê Apê Selim. Çi bikira ew bav bû, mamoste bû, ser van hemûyan ra ji, ew gelek mirov hêz bû. Wi ruhiyeta "tenê mayinê" baş tê digihuşt.

Hevaltî hêjayî çiyê? Bersiva vê pîrsê, bi rasti pîr dijware, Kesên bi Apê Selim va hevaltî kiribin, ewê bîbin ku hevaltî ji 12 kesan pêk nayê û mirov pê futbol nalize. Hevalên rîya dîr û dirêj, hevalên nehejm, nehîv û di dawiyê da hulneweşin, nekevin orta rê, pêşiya rê negrin. Kesên heval destê hev digrin, hev hez dikin, navbera hevalên rastin da pîr peywendiyên dilovan hene, ji ber ku ew hevalên rêya dîr û dirêjin, Ew di rêkê da du kesên rûyê hev nenêhîrin, rûyê xwe bi hev

tirş bikin, hev hez nekî, ew tenê di vê rê da wek du kesên bêcan paralel dimeşin. Hevaltî ya wan ewqas hêsaye. Heval hene, hevalok hene... Ji ber vê yekê Apê Selim ji bo pêkanîna pêywendiyên xurt, hişt û germ, di nav hevalan da bûbû nişana dostaniyê, hevaltîyê. Di dilê wi da, wek behreke şin, tenê hevaltîyê pêl dîda. Ne tenê di nav rêxistina xwe da, di nav havalên xwe yê politik da, vê hevaltîyê di nav rêxistinên din da, di nav dostên din da ji pêl dîda. Xet û sinorên hevaltîya Apê Selim tu wext teng nedibû, her diçû fireh dibû... Ji ber vê yekê mîrîne lê dexesi dikir, bûbû seyê har, li dor wi diçû -dihat dest ji pêşira wi bernedîda, mîrîne hertim nîfir dibarand û digot. 'camêr kezêba te reş be, mîrîk kezêba te reş be'.

### QÛRSA ZIMANÊ KURDÎ

NORDENS FOLKHÖGSKOLA BISKOPS ARNÖ (XWENDEGEHA GELÎ YA BAKUR) Û KOMA NIVISKARAN LI SWÊD BI HEV RA DI NAVBERA 30' YÊ TIRMEH (TEMMÛZ) Û 4'Ê TEBAXA 84 (AGUSTÎ) QURSEKE KURDÎ AMADE DIKIN. DI QURSE DE NIVISANDINA KURDÎ TÊTE HIN KIRIN. HUN DIKARIN ZAROYÊN XWE JI BI XWE RE BÎNIN. CIYÊ LI ZAROYA NIHÊRTINÊ JI HEYE

MAMOSTEYÊN QURSÊ: M. EMİN BOZARSLAN Û FERHAT ŞAKELÎ.

JI BO MURACAATÊ:  
BISKOP - ARNÖ  
198 00 BÂLSTA

# KONGRA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD YA 4.a PÊK HAT




Lars Gunnar Eriksson,  
Jî Sazgeha Resmi yê  
Biyaniyan li Swêd.

Kongra federasyona Komelên Kurdistanê ya 4.a, di 17-18 Çileyê Pêşîn da li Stockholmê pêk hat.

16 komelên endam, bi 48 nuneran (delege) va di kongrê da beşdar bûbûn. Gelek rêxistin û kesên bi nav û deng ji kongrê ra silavname şandibûn.


Roja yekem li ser rewşa komelên endam rabezinên dîr-dîrêj çêbû. Di roja duwem da biryar hat girtin ku: divê her komele watîniyên xwe gişt binin cih. Ji bo vê yekê kongre meh û niv hat paşve avêtin.

Di 4-5.ê Sibatê da kongra federasyonê disa bi 48 nuneran va dest bi kongrê kir. Rewşên komelan ji nû va hat kontrol kirin û kongre dest bi xebatê kir. Li ser kar û barên Federasyonê rabezinên dîr-dîrêj hat çêkirin û kar û barên komita karger bi piraniyan nuneran va hat rû-



Nunerek ji Partiya Komunist a Cep (VPK)





Elisabeth Bergström, Ji Amnesti Internasyonal li Swêd.

Federasyonê, 4 komelên Kurdistanê bî hevra li dîji zulm û zordestiya li ser gelê kurd, meşek pêkani bû. Pîştî vê meşê mecal ji me ra çê bû, ku em wezîrê derva yê wê çaxê Olla Ullsten bîbin. Wexte ku me alîkariya wi ji bo gelê kurd xwest ew tîm sebaba perçebûyîna kurda hem civaki, hem siyasi li pêş me datani. Gelo ev gotin ne samimi be ji, ku ditîna me hemûyan ew bû, lê rastiyeke diyar dîkîr. Me ew zincira kevna şikand û li Swêdê hêzên welatparêz kir yek. Bê şik, dengê me iro hê bilindtir, û em hê bilindtirin.

Bê şik gelek kêmasiyên me he nîn. Lê me bîyara xwe daye, emê pêşva herin, xurttir bîbin, jirtir bîbin. Yekgirtina me yê welatparêzi êdî buye rastiyeke, jê weger tune.


Dûmanîk li rûpeî 18' an e.

spikîrîm. Ji bo komîta Karger 7 kes û ji bo komîta Çavdêr ji 5 kes hat helbijartî. Kongre bî serfirazi dawî hat.

## AXAFTINA SEROKÊ FEDERASYONÊ

Nuner û mêvanên hêja!  
Hun bî xêr û xweşî hatî kongra federasyona komelên Kurdistan li Swêdê. Em iro bî gavên bî hevra gihane kongra federasyonê ya 4.a. Ez bawerim ku ev bî serê xwe tenê serfiraziyeke ji bo me hemîyan. Ev yekitiya fireh tîşteki vekirî diyar dîke, ku em dixwazî yekbî, firehbî, bî hêztrîbî. Federasyon bî dilsoziya welatparêziyê ava bû û disa dê bî vê dilsoziyê bî dome.

Tê bira hevalên me yê kevî li Swêd, ew heval kû bûbûn bîgeh ji bo damezîrandîna Federasyonê. Me beriya avakîrîna



Oswald Söderqvist, Parlamenterê Partiya Komunist a Çep li Swêd.

# BERNAMA

# MAMOSTEYÊN KURD

*Rohat*

## DESTPEK

Pîrsa hinkırına zımanê kurdi iro lı herçar beşên Kurdistanê ji qedexeye. Bı rasti ev hêzên zordest tu wext nehiştine lı Kurdistanê dibistan, xwendegêh û zanîngêhên kurdi vebın. Nijadi, kevneperestî û şovenizm lı Kurdistanê her çûye tûjtr bûye. Hêzên kolonyalist dıxwazın gelê me zêndi bıkıne gorê.

Iro zarokên kurd lı Kurdistanê pêwistin zımanên bıyani wek zımanê tırki, farisi û zımanê erebi. Hinbûna zımanê dê (mader) ji bo zarokên kurd pır tışteki dijwar û çetne.

Tenê car-carna lı Kurdistana Iraçê, ji ber bılındbûna şerê gelê kurd çend dibistan hatine vekırın û paşê disa hatine gırtın. Bı dilê xwe van tu car nexwestine zarokên kurd zımanê dayıka xwe bı serbesti hin bı.

Lı Kurdistana Tırkiyê, ji bo hinkırına zımanê kurdi destûr tu

çax nehatiye dayin. Jı destpêka dema Atatürk vırda heta niha asimilasyonêk (mê jişuştın) fıreh lı vi beşê Kurdistanê dajo. Dı nav vê rewşa nebaş da zarokên kurd pêwistin zımanê tırki hin bı.

Lı Kurdistana Iranê zordestiyên kevneperest û şoven ji hışki ya xwe tu tıştek heta neha wında ne kıriye. Gelê me çawa tê zanin dı dema Şahê gorbıgor da dı nav nezaniye mezın da dıxeniçi.

Ev zordesti dı sala 1946 an da, dı dema komara Mehabadê da ji ortê hate rakırın, lê vê demê ji kurt ajot. Zımanê kurdi de vê demê da dıbe zımaneki resmi û bı çanda kurdi va hevra destpêdike, pêşta diçe. Paşi şoreşa Iranê ji tu tıştek ne guheri, vê carê gelê kurd kevneperestike hin ji hovtir dit. Lê dı war û hêlên azad da mamoste û dersdarên niştıman perwer bı destên komên politik da gıhıştın.

Ew çûna Kurdistanê ji bo zımanê kurdi hini zarokan bıkın. (nêzkaya 400 dersdar.) ;

Gelê me Lı Kurdistana Suriyê ji berberiyên şoven û paşverû di tiye. Hinbûn-Hinkırına Zımanê kurdi hertım hatiye qedexekırın.

Dı dema Fransız lı Suriyê dıman, bı destê zane, pıspor û ronakbirên kurd da, bı tehreki veşarti hinkırına zımanê kurd kê m-hındık ajotiye. Derketına rojname-kovarên wek "Hewar" "Roja Nû" "Ronahi" pır alikariya pêştaçûyına zımanê kurdi kırt û himên -bıngêhên zımanê kurdi lı ser elifbaya latini hate dayin. Bı taybeti Celadet Bedirxan û gelek ronakbirên kurd dı warê vê serfiraziyê da roleke mezın listın.

Iro zarokên kurd tenê lı Sovyetistanê dıkarın zımanê dayıka xwe bı serbesti hin bı. Ew dıçın dibistanên kurdi û hemû dersên xwe bı zımanê kurdi hin dı bı. Jı bo dersdarên kurd lı Erivanê cara pêşın zanîngeheke dersdariyê hate vekırın. Dı nav gelek salan da, dı vê zanîngeha pedagogiyê da pır mamoste gıhıştın. Lı Ermenistanê gelek material lı ser zımanê kurdi hatın pêkanin û hejmaran van materialan iro gıhıştıye bılındahiyeke mezın. Vê gavê gundên kurdan da, dibistanên kurdi û dersdarên jê hati hene.

Çawa tê zanin iro lı dora 500 hezar kurd lı Ewrûpa dimının. Carna bı destê hin rêxistinan çend kurs vedı bı, lê ew ji bı rasti nıkarın karên xwe ewças pêşda bı bı bı serfiraz bı bı. Lı Ewrûpayê tenê lı Swedê ji bo zarokên kurd matên hinkırına zımanê kurdi heye, lê ew ji ne bese.

Lı Ewrûpayê, iro xebateke pır kêr hati lı ser zıman û çanda kurdi dajo. Bı destên rêxistin û komelên kurdan gelek material bı zımanê kurdi çap dı bı wek rojname, kovar, pirtûk û mate-



rialên dîn. Çawa tê zanin li ser zimanê kurd li Ewrûpê zordestike wusan mezîn tune. Mirov dikare hêsa û bi serbesti dî wî wari de karê xwe pêşda bibe.

Bî kurti em dikarin bêjin ku di nav vê rewşê da hinkirin-hinbûna zimanê kurdi kareki wusan piçûk û hêsa nîne. Bo vê yekê pêwîste her welatparêzêki kurd bibe şagirt û paşê bibe Mamoste. Tîştên nû dema em hinbûn disa pêwîste em van tiştan hini dorberê xwe bikin. Dî wî warida barê giran û berpirsiyara mezîn dîkeve li ser mamosteyên zimanê kurd. Lê hejmara Mamosteyên zimanê kurdi wek tiyên destê wusan kêmin. Bo vê yekê dersdar û mamosteyên kurdi pêwîste formasyonêki dersdariyê bî destxîm û jî kurseke zimanê kurdi ra derbaz bin.

#### MAMOSTEK DI WARE KARÊ XWE DA ÇAWA DIKARE PEŞKEVE?

Dersdar- mamosteyên zimanê kurdi cara pêşin pêwîstî zimanê kurdi baş deng bikin (bipeyvin), rast binivîsin, bixwin û baş tê bî gihên (fêm bikin). Jî ber zarok, piçûk û xwendekarên me wê li ber destê wan mezîn bîbin. Ew çiqas li haj prensibên zimên hebin, wî nas bikin, ewana wê ewqas dî karê xwe da serfiraz bîbin. Lê jî aliyê dî her mamostek pêwîste li ser pîrsên pedagogiyê agahdar û zane bibe. Zanebûna tehr û cûryên hinkirî nê jî wan pîr tiştêki grînge. Bî kurti zanina zimanê kurdi û hinbûna bîngehên pedagogiyê pêwîste bî hevra bimeşin. Em van herdu faktorên jî hev nîkarin bî dî qetandin.

Disa ew pêwîstî li ser pîrsên sosyoloji, filozofî û psikolojiyê bî jêhati bî xebitî û gelek tiştan jî ber wan bigrin, Bî wî tehri li pêşiya mamosteyên zimanê kurdi dergehên fireh dîrî vebî û dî warên karê xwe

da ew dikarin tenê bî wî tehri pêşkevin. Tenê zanin û teori ne bese, mirov jî aliyê dî pêwîste wan derbasi pîratîkê bike, biceribîne û rast bide xebitandinê. Dî dawiyê da ew dikarin bigin menzila xwe. Lê kingê dersdareki ev yekana anî cih, ew êdî dikare tiştan jî hev derxe (analiz), Wan nêzîki hev bike (sentez) û wan li hemberî hev bike.

Jiyin bî xwe jî ewqas ceribandî nê dewlemend û rengin va xemliye ku, dikare jî bo her mamosteyeki bibe defineke hinbûn û zanîne.

Dî warên gihîştina dersdarên zimanê kurdi da tenê ew faktorên li jor gotî, ne besin. Jî aliyê dî dersdar - mamosteyên zimên li ser literatur, zargotî (folklor), dirok, çand, erdzanî (geografi) û li ser etnografiya kurdan pêwîste pîr tiştan bî zanînin.

Dersdar û mamosteyên zimanê kurdi, dî wî warê xebatê da çawa dikarin pêşkevin bighejin û bîbîne mirovên zane. Bersiva vê pîrsê, dî wê rewşê da pîr diware mirov bide. Jî bo wê yekê ku zaningeheke têda mamoste digihîjî iro li Kurdistanê û Ewrûpê tune. Iro li Ewrûpê li çend beşên (par) hîne unîversîtada xebatên kurdzaniyê (kurdoloji) dajon, ew jî nîkarin mamosteyên zimanê kurdi bigihînin, amade bikin, hinê metodên perwerdekirî (terbiye)kin. Jîber wê yekê iro hejmara mamosteyên kurdi pîr kêmin. Lê em çawa bikin? destgrêdayî bîmin, na, eva yeka nebaşê.

Dî wê demê da mirov nîkare zaningeheke jî bo dersdaran veke, ev tiştêki diware. Lê mirov dikare kursên demkurt, wek 6 meh- 12 meh veke, jî bo têda bigihîjin. Ev yeka iro bî taybetî li Ewrûpê û li Kurdistanê de warên azad da dikare bî

serfirazi bimeşe.

Jî wê baweriyê pêwîste program (bername) li pêşiya me hebe. Em li jêr jî bo kurseke hinkirîna zimanê kurdi programeke pêşkeşî mamosteyên zimanê kurdi dikin. Em bawer dikin ku ev programa, wê kêrî xebatên wan bê û mamoste dikarin wê programê angore merc, hoy û rewşa xwe hin jî pêşta bîbin, hîne tiştan li serda zêde bikin:

- 1-ZIMANÊ KURDÎ Û GRAMATIKA WÎ
- 2-LITERATURA KURDÎ
- 3-EFRANDINÊN ZARGOTÎNA(FOLKLOR) KURDÎ
- 4-DIROKA GELÊ KURD
- 5-BINGEHÊN ÇANDA KURDÎ Û REWŞA İROYİN
- 6 - DI WARÊN HINKIRINA ZIMANÊ KURDÎ DA ROLA ÇEND PIRSÊN PEDAGOGIYÊ

Ev xalên jorin dî nav xwe da dî karin li ser keriyên (perçe) hin jî piçûk pare ve bin.

#### ZIMANÊ KURDÎ Û GRAMATIKA WÎ

Cara pêşin dersdarên zimanê kurdi pêwîstî li ser zimanê hemû cihanê agahdar bin, li ser ser ziman û prensibê wî pîr tiştan hin bîbin. Dî wî wari da hewce mamosteyên kurdi haj jî van faktorên jêrin hebin:

- a) Ziman çiye?
- b) Rola ziman dî warê jiyîna civakî, aborî, politik û dî jiyîna hunerî da çiye?
- c) Hemû zimanê cihanê li ser çend koma pare ve dibin?
- d) Heta nîha hemû zimanên cihanê çawa pêşta çûne, guherîne û hatne gihîştine van rojên iroyîn?

Çî wextî mamoste li ser hemû zimanên cihanê hîne tiştan hinbûn, êdî ew dikarin şûna zimânê kurdi dî nav van zimanan da

hin bn. Dersdarên kurd û mamoste. paşi vê yekê pêwistin li ser him û bingehên zimanê kurdi bisekinin. wek,

- Diyalek û zaravên zimanê kurdi û pîrsa yekitiya zimanê kurdi.
- Peyvendi - kontaktên zimanê kurdi bî zimanên gelên cînar va, wek zimanê Ereb, Fars, Tirk û Uris...
- Lî ser zimanê kudi heta niha çî hatine nivisandin, çî xebat pêk hatine û ev xebatana niha çawa dajon?
- Hine zordestiye politik li ser zimanê kurd, wek asimilasyon û entegrasyona negatîf li çar beşên Kurdistanê.

Xebata bingehin ji bo dersdarên kurd hinbûna (fêrbûna) gramatika zimanê kurdiye. Gramatika zimanê kurdi gramatikeke wusa dijwar û tevlihev nîne. Heta niha li sêr zimanê kurdi gelek materiyal bî zimanê cûre-cûr hatine nivisandin. Dî nav demeke kurd da pîr mirov bî alikariya van materiyalan zimanê kurdi xweş hin bûne. Mirov pêwîste xwe bide li ber hemû dijwariyan, wê çaxê tu tiştê nikare ji destê mirov bîfitile. Dema mirov dil kir û motivasyoneke baş va ew dikare zora her tiştî bibe. Dî warê hinbûna zimanê kurdi da pêwîste her mamostek van her çar pîsên jêrin xwe ra bîkin armanc û daxwazî:

- Rastxwendina zimanê kurdi
- Rastnivisandina „ „
- Rastdengkirina „ „
- Rastfêmkirina (têgihîştin) zimanê kurdi

Iro ji ber tunebûna dewleteke kurd zimanê kurdi nebûye zîmaneke resmî û cure-cure elifba li Kurdistanê hene.

Mamosteyeki kurd hewce elifbaya kurdi, dangan (sewt) û tîpên (herf) kurdi cara pêşîn rast bî zanibe. Dema ku ev gava baş

ne hate avêtin, hertim xeletî, şaşî û çewtî derkevne li pêşîya wan.

Gramatika zimanê kurdi dî nav xwe da parevedike li ser çend beşan Her beşek naveke wê heye, mamosteyên kurd ji bo vê yekê van beşên zimanê kurdi pêwîstin rast hinbin û ji hev derinin. Zane û zimanzanên (filolog) ku li ser zimanê kurdi xebitine car-carîna ev beşana bî cuda nav kirine. Dî pirtûken Q. Kurdo û K. Bedîrxan ev cûdetiya pîzelale. Lî ser navên van beşan, Elmani û Tirkiya wan li hembere hev hatine rêz kirin:

Nav (Nav). ....İsim (Das Substantiv)  
 Keysetnav (Rengdêr)....Sıfat (Das Adjektiv)  
 Cinav (Pronav)...Zamir (Das Pronomen)  
 Fêl (Lêker)...Fiil (Das Verb)  
 Bernav (Daçek)...Edat (Die Partikel)  
 Pevgîrêk (gihanek) ....Bağlaç (Die Konjunktion)  
 Heyholan (Baneşan)....Ünlem (Die Interjektion)  
 Fêlniş (Hoker) .... Zarf (Das Adverb)

## LİTERATURA KURDİ

Litteratura (Edebiyat) kurdi pîr kevne, bingeha wê diçe dighêje sedsaliya (qurne) 12-13 (angori çavkaniyên niviski). Litteratura kurdi ji aliyê din da litteratureke dewlemend, rengin û hêjaye.

Mamosteyên zimanê kurdi efrandinên niviskarên kurd pêwîste nas bikin û bedewiya litteratura kurdi derxin ronahiyê. Bî vi tehri ew dikarin karên li ser ziman hin ji pêşta bîbin. Mamosteyên zimanê kurdi ji aliyê din pêwîstin pîr tiştan ji ber litteratura kurdi bigrin û van tiştan dî warê hinkirina zimanê kurdi da bikin materiyal û bîdin

xebitandin Lî ser vê rêza Jêrin mirov dikare bî sistematîk litteratura kurdi fêr bibe.

- Dî demên klasîk da litteratura kurdi
- Dî dema nûjênda litteratura kurdi
- Pêşçûyina litteratura kurdi
- a) Lî Kurdistanî Tirkîyê
- b) Lî Kurdistanî İraqê
- c) Lî Kurdistanî İnanê
- d) Lî Kurdistanî Suriyê

- Litteratura kurdên Sovyetistan  
 - Hine karên litteratura kurdan li dervayî welat

Mamosteyên kurd, dî nav litteratura kurdi da dikarin zelalî, ziravî û bedewiya zimanê kurdi baş bîbin. Tenê hinbûna gramatika kurdi ne bese, heta niha ev zîmana bî destê niviskarên kurd çawa hatiye xebitandin, vê yekê ji, mamoste pêwîstin bibînin.

## EFRANDINÊN ZARGOTINA (FOLKLOR) KURDİ'

Iro dî nav gelê me de zargotîneke dewlemend, jindar û bedew heye. Zargotîna kurdi bî xwe bingeh û çavkaniya litteratura meye. Zîmanê niviski çawa tê zanin li welatê me hatiye qedexekirin, bo vê yekê gelê me zargotîna xwe dî mîjû û dî dilê xwe da parastîye. Ev bî sedan sale, zargotîna kurdi li ser zarzîmanê gelê me digere gelek kes ji devê hev digrin û ji hev fêr dibî. Zargotîna kerîkî çanda gelê me ye. Bo vê yekê perçe û nûmûneyên zargotîne dî warê hinbûnê hinkirina kurdi da dikarin roleke mezîn bilîzin. Mamosteyên kurdi pêwîstin li ser hemû beşên zargotîna gelê xwe pîr tiştan hin bîbin, karên xwe hin ji baş bixemilînin û pêşda bîbin. Ji aliyê din, mamosteyên kurdi dî wextên vala da dikarin ji devê gel zargotîna kurdi berev bikin û belav bikin.



Cara pêşin mamosteyên zimanê kurdi pêwistin beşên zargotina kurdi ji hev derinin û wan baş nas bikin. Lî jêr li ser beşên zargotina kurdi bi kurti hatiye sek nandin:

a) Destanên kurdi (wek mem û zin, ker û kulik, zembilfiroş, Siyabend û xecê...)

b) Stranên kurdi (klam)  
 -Stranên dîlan, bengiti û hubê  
 -Stranên şeran, mêrani û dirokê  
 -Stranên şinê  
 -Stranên govendê  
 -Stranên olperesti (dîn)

c) Mesele û Metelokên kurdi, Carna ji wan ra dîbêjin 'Bendên Pêşyan' û 'gotinê kal-bavan'

d) Çirokên gel  
 e) Pêkenî (laqrîdi-henek)

f) Jêderxistinok (tîştonek, mamîk)

g) Serpêhatiyên (hukyat) kurdi

h) Hevbendiyên kurdi (Hevoken kû di nav xwe da maneke dîn vedîşêrin).

Mamosteyên kurd van efrandînan pêwistin bi hehreki fire hin hin bîbin. Ew disa lazîme bîngeh û himen zargotina xwe baş nas bikin, bi kolinin.

## DIROKA GELÊ KURD

Mamosteyên zimanê kurdi li ser diroka gelê kurd ji destpêkê vîrda heta niha pêwistin turîkê zanina xwe fireh bikin û pêşta bîbin. Ne tenê diroka politik, ji aliyê dîm hewce diroka litteratur û Şarezatîya gelê kurd ji fêr bîbin, bi diroka kurdistanê va bigihme hev. Demên derbasbûyî û kevn li ser rewşa Kurdistanê dîkarin me hîni pîr tîştan bikin. Pêşdaçûyîna rewşa politik li Kurdistanê li herçar beşên

welat rêke pîr dirêj hildaye û gelek bûyer- qewmandinên mezin li Kurdistanê pêk hatine. Bi kurti bendên şîdiyayî û xurt di navbera dirok û çanda gelê Kurdistanê da heye.

Disa li ser rojên diroki, wek roja karkerên cihanê, roja jinan a navnetewî, roja zarokên cihanê û li ser roja cejna Newrozê mamoste pêwiste ji gelek tîştan agahdar bin.

Ji aliyê dîm tevgerên gelên bîndest û tekoşîna gelê kurd, her mamosteyekî kurd pêwiste hemberî hev bike û li ser rewşa wan welatan bi tehreki dirokê pêwiste dîr û dirêj bisekine.

Lî ser diroka gelê kurd dema mamoste dixebitîn pêwistin bi sistematîk karên xwe bajon, wek heremên pêşin, navin û nêzik pêwiste ji hev derinin (veqetînin).

## BINGEHÊN ÇANDA KURDÎ Û REWŞA ÎROYÎN

Kurd kîne? Çawa dijîn? rabûn-rûniştin, xwarin-vexwarinê wan çine? bi çî va wextê xwe derbas dikin? wek van pîrsan bersivên gelek pîrsên dîm pêwiste mamosteyên kurd fêr bîbin. Sazbendî, tiyatro, reqs-listîkên kurdan, çêkirina hacetên destan û derbasîkirina şahîyan: di nav kurdan da çawaye? hemû ev yekana pêwistin bal û guhdariya mamosteyan bîkşîne ser xwe. Ji bo parastin û pêştabîrîna çanda kurdi hewce her mamosteyek berpîrsiyareke mezin hilde li ser milên xwe.

## DI WARÊ HINKIRINA ZIMANÊ KURDÎ DA ÇEND PIRSÊN PEDAGOGIYÊ.

Dersdar û mamosteyên zimanê kurdi çawa çanda kurdi da formasyonêkê destxîm, wusan ji ew pêwistin di warê pedagogiyê da pîr tîştan fêr bin. Ji bo vê yekê

ku dersdayin karê herkesî nine û ji destê herkesî nayê, ew pêşeyeke. Em li jêr çend prensîp û bîngehên pedagogiyê pêşkêşî mamosteyan dikin:

● Mamosteyên ku dersên zimanê kurdi di xwendegahan da didin, hewce ev li ser programeke qenc, rast û sistematîk karên xwe bimeşînin. Programeke hîşk, demdirêj û giran di nav vê rewşê da bi hêsa û serfirazî nîkare bîqede. Bo vê yekê çawa li Kurdistanê wusan ji li dervayî welat mercên azad tunene, ji bo hinkirîna hemû tîşt li ber destan amade nînin. Mamosteyên zimanê kurdi dema dest bi programa xwe bikin pêwistin vê yekê bîdînin li ber çavên xwe.

● Mamoste li ser litteratura zarokan pêwiste hîne tîştan berev bike û psikologîya zarokan baş nas bike. Ew dîkarin jiyîna heywanan wek gur, rovi, se-kuçîk, pisîk mîşk û û teyr-tuyan zarokan ra deng bike. Disa çirokên piçûk dîkarin hinkirîna zimanê kurdi ji bo zarokan hêsa-tîr bike. Zarok ji çiroka hez dîkî carîna mamoste pêwistin ji zarokan ra çirokên kurt qise bikin

● Mamoste ji aliyê dîm dîkarin deng bikin ku li havîn, payîz, zîvistan û li bîharê çî dîbe, jiyîn çawa çalîkê xwe diguhîrine. Navên xwarin vexwarin û temiyên li dor berê zarokan dîkarin disa guhdariya zarokan bîkşîne ser xwe.

● Her mamosteyek cara pêşin li ser dîrsa nû pêwiste gelek materiyan berev bike û tehrê dersdayîna xwe baş amade bike. Her mamosteyek destvala bimeşe here dîbîstanê ev karekî baş nine û mamoste nîkarin di dersê xwe da serfiraz bîbin.

● Di warê metodê rê û tehrê hinkirîna da, mamoste hewce jêhatî bixebite. rêke çêtir, hêsa û rastîr bide pêşîya xwe.

● Bijartina tekstan û perçeyên xwendinê lazime xwendekaran (şagirt) bihinine gyanê (ruh) welatparê ziyê û mirovhezîyê, vê berbirsîyariyê tucar mamoste hewce bir nekî

● Her mamosteyek bî zarekî şirin û dî nav atmosfereke germin da bîkaribe dersên xwe derbaz bîke, wê dî karên xwe da hin jî serkeve.

Mamoste dema dest bî derseke nû dîke, hewce bî kurtî lî ser dersên bîhuri bîsekîne, paşê dest bî tîştên nû bîke, bî vî tehri ew dîkare babetên berê hînbûyî bî dîrsa nû va grêbîde.

● Angorî merc û rewşa naveroka dersan mamoste pêwîstî derse n xwe kurt, an jî dirêj bajon. Bo vê yekê mamoste dersê xwe çîqas dirêj nekî, wê ewqas baştir bibe. Mamoste jî tîştên hêsa - piçûk berbî tîştên tevlihev û giran pêwîste bimeşe. Bî vî tehri xwendekar şagirt dîkarî dersan hata dawiyê guhdar û mêze bîkî.

● Mamoste pêwîstî paşî xelasbûna dersan hîne spartînan (pêşdanî, wezîfe) bîde şagirtan ku şagirt lî mal lî ser wan pîrsan bîxebîtin. wan bî devkî an jî bî nivîsî bigre. Dî vî wari da mamoste hewce cara pêşî şaşî û xeletîyan nişan bîde, paşê rîya rastiyê bêje. Dî van karan da ajotîna disiplîneke hîşk ne başe, divê ev karan şagirtan netirsînin.

● Paşî rînd hînbûna dersan û zelalbûna pîrsan mamoste dîkarî cerbandînan pêk bînin. Ev cerbandînan pêwîstî dî nav mercên (şert) azad û objektîf da bajon.


● Mamosteyên zîmanê kurdi pêwîstî xwendekar û şagirtan baş nas bîkî rewşa wan, problemên wan, kêmasî an jî hunerên

● wan dîkarî dî warê hînkîrîne da pîr tîştan mamosteyan ra nişan bîdî. Cudatîya dî navbera şagirtan pêwîste jî ber çavên dersdaran nereve. Ew hewcî lî ser her şagirtêki yek-yek bîsekînin.

● Dî dema dersdayînê da mamoste graniya xwe pêwîstî biparêzî. Ew pêwîstî şûna mamoste û şagirtan jî hev cuda bîkî. Dema serêşîk peyda dibe ew jî şagirtan ra bêje 'Ez serê we ez jî nîzanim, ew çîye' wê çaxê her tîşt tevlihev dibe û rûmeta hînkîrîne namîne.

● Mamosteyên zîmanê kurdi dema karên gramatikê dîmeşînin, pêwîstî car-carîna dersên gramatikê bî bî lîteratur, folklor, dîrok û bî nîmuneyên çanda kurdi va bîxemilînin. Hemû ev karan pêwîstî dî nav hevda cîh bigîrî û hevra bîmeşî. Bî vî tehri şagirt bî huşyarî û aktîfî dîkarî dersan guhdar bîkî. Ew hîne caran jî dî nav dersan da pêwîstî atmosferaya dersan jî serêşîyê xelas bîkî.

Bî kurtî mamoste hemû merc û rewşa dorberê xwe, rewşa şagirtan qencîya materyalan û amadebûna xwe çî wextî gîhande hev, ew dîkare bibe mamosteyekî serfiraz û jêhati.



Dûmahîka rûpelê 12' an

Hevalên hêja!

Lî welatê me seranser zor û zulma dijmin dîdome û ew bî her metodên har û hov êrişê hêzên rîzgarîxwazên Kurdistanê dîkî. Jî ber ku çar aliyên kurdistanê gelê kurd jî mafên xwe yê nîlî û demokratîk şer dîke.


Lî Kurdistana Îran û Îrakê gelê kurd bî çek şerî gelek dijwar dîde. Dijmin derdora Kurdistanê girtîye, bî vî awayî dîxwaze şerê gelê kurd bîfetsîne. Bê şîk vê yekê şerê gelê me gelek dijwartîr dîke. Lê gelê kurd, hîne rojên dijwar bûye, bî tunebûn û xîzaniyê rabûye. Tu hêz, tu qewet dê nîkarîbê daxwazên gelê kurd jî bir û ramanên wê derxe.

Îro hêzen emperyalîst, lî her derê cihanê şerê hêzên pêşverû dîkî, dîxwazî hêzên şoreşgeran bî qetliaman bîşkêne.

Lî Amerika latîni, gelên El Salvador û Nîkaragua lî hember êrişên Amerika Yekbûyî bî mîrxasî berxwedîdî. Lî rojhelata navîn hêzên emperyalîst jî bo çîrkîrîna gelê Filîstî û Lubnanê dî nav erîşên gelek har dane. Lî Tîrkîyê jî bî daxwazên emperyalîstan, bî taybetî ya Amerika Yekbûyî, cuntakî faşîst hate ser hukûm, û her derê Tîrkîyê û Kurdistanê vegerand cîhe zîndan û lêdanê. Îşkenceyên gelek hov lî lî ser kesên pêşverû, demokrat û şoreşger pêk tê. Bê qanûn û nîzam lî Kurdistan, qetliam pêk tê n.



# BI SWÊDÎ KITÊBEK 'LI SER KURDAN' DERKET!



Sazgeha Biyanîyan li Swêd (Statens Invandrarverk- SIV) bî alîkariya Federasyona komelên Kurdistan li Swêdê kitêbeke bî navê "om kurder" (li ser kurdan) derxist. Nivîskarê kitêbê Alar Kuutman e û bî Swêdî hatiye nivîsandin. Kitêb, dirok, zîman, çand, rewşa siyasi ya nû û ciwarbûna gelê kurd û her ûsa

li ser rewşa kurdên li Swêd (4-5 hezar) bî frehi informasyon dide, û 253 rûpele.

Yek jî girîngiya kitêbê ewe, ku sazgeheke dewleta Swêd 'Statens Invandrarverk' vê kitêbê derdixe ango reneki resmî girtiye.

Ev yeka xuya dike, ku tekoşîna gelê kurd li welat û li derveyê welat, rewşa gelê me her zêdetir daye nasin.

Buhayê kitêbê 25 kronê  
Adres: Statens Invandrarverk  
Informationsbyran  
Box 6113 600 NORRKÖPING

## EZ HATIM SOSIN

Buhar hat û ez bûm şivanê, ew sosinê lı çol belav bû  
 Simbil ditim go; hevalo tu l' çı dıgeri ?  
 Karê te ev e  
 Bı roj tu tê û şev vedigeri  
 Mın go; Simbil çend pırs hene, mın divê bêjim...  
 Lê j wara nabinim tu ri  
 Go; hevalo bêje, bêje tu l' çı dıpirsi  
 Kes nabihisi tu ne tırsi  
 Go; hevalo bêje, bêje  
 Gı ro çû ava  
 Şev dirêje  
 Mın go simbil yarık jı mın lı van wara wunda bû  
 Ê pışti yarê dil cıda bû  
 Hın ma pêve  
 Ê hıne'd mı de çet zuwa bû  
 Go mın; hevalo tu ne êşe  
 Yara te lıvıre, çend gav lı pêşe  
 Mın go; sosin e' hatım  
 Simbil ban kır go; hevalo, bısene  
 Mı j ter wa ne go, na... na...  
 Yara te diêşe  
 Bo te dınale şev û roje  
 Te çıb serê wêna ani  
 Bılbıl lı nık wê hêlin dani  
 Bı halê wê deng dibêje  
 Mın go; Sosin, hatım, hatım  
 Simbil ban kır  
 Mın go; Simbil dem direve  
 Hatım Sosin  
 Te bıparê zim vi wan dest û awirê n çava  
 Rû te bışom bı ronıya heyvê, bı wa xunava  
 Te av bıdım bı rehê dı canê mın de... teve  
 Te hılgırım bıkim ev dilê tışt jê nemayê  
 Ger ew tıştê simbil go mın tev bı raye

Ronak Dılxweş

Dilan heyê lı gundê hanê  
 Were em herın dilanê  
 Dısmal sorê meş granê  
 Were em herın dilanê

Hey cana mın tu bı nazi  
 Dıl bûye ar te dıxwazi  
 Bınêr lı me dıkın gazi  
 Were em herın dilanê

Bûk çizeki şûx û şeng e  
 Zava xorteki çeleng e  
 Rabe idi wext dereng e  
 Were em herın dilanê

M.HESINPAK

Dıyarbekır- 1983

## ROJA CIVINÊ

Gava mın tu diti tu hati, ez sekinim benda sılavê  
 Nıza'z bıminım yan bıızırım, ez heyirim ketım navê  
 Ev roja civinê çend salê m ez lı benda  
 Mın jêr hılani lı çava mûm û fında  
 Ez mam û wek nenasa tu buhuri  
 Mın dest dani lı ser singi, mı go dılo hê tu lıvıri  
 Dıl cımdı bersıva mı ne da  
 Mın zanıbû te ruh bıri  
 Mın ew da te, ma tu ew navê ?  
 Evin ave ez bûme gemi û ketme serde  
 Kevokê bısene... yarê bışene  
 Kevokê bısene... pırsê m hene  
 Hêlin deyne lı deştê me lı serê darık  
 Besê mıne ez te bıbinım rojê carık  
 Sika hêlin besê mıne gı bıbe warık  
 Yan tu divê hêlin deyne wek bazeki lı wa bılında  
 Canê m bıbe û jı wan jora tı ew berde  
 Da bıbım pırsê evına salık  
 Ê belav bıbım lı bajar û gunda

Ronak Dılxweş

# G Ê L A S

giyan! ez nû tê gihuştim  
Çıma berê  
Helbest tamam nedibûn, dıhatın kûştın.  
Çınkê mın nızanibû ku tu huner bû,  
Tu dayika hunrawan bû,  
Tu jıyan bû.

Giyan!  
Odêssa yekem bender bû  
Telqın dıxwand bı horrinê  
Gemyê  
Bı livına Şostokoviç,  
Dema dirêj  
Mın nijand dı gorristanê  
Dılı xweda  
Em man dı nav sinoranda  
Dûr dūr  
Lı welatan, Kontênêntan.

Giyan!  
Lı her deran we dıbinım,  
Lı bajaran,  
Dı basan da,  
Dı nav liskê n zarokanda,  
Dı nav şepûlê n deryanda,  
Dı xwevnê da  
Wê dıbinım  
Lê lal dıbım,  
Nıkanım ez dı paş perdê  
Dûrbûnê da bı wê ra dengkım, bılızım.

Sıroşt lı vır rast beheşte,  
Lê jı mirovi yara wê  
Ne dı gund da  
Mıman qaska  
Oıtranê ağır dı bında'  
Royê vır sare bapeşke  
Bı ser mında dıbarine,  
dıguvine.

Jı mirovi nivı temeni xwe

Dı nav pirtûkanda derbaskırı  
Gelek pê çetine berhemê n meseni bıbine  
Lê gavê xendê n te hıldıpekin  
Lı ser lêvê te  
Û wek pê pılûskan lı ser gulê  
meraçê n mın dilızın, dınışın.

Ez dıbûrinım  
Dızekê n huneri û zanısti..

Giyan!  
Darê zaninê agire  
Mırov dıke rreji, ari  
Gavê nızanibe xwe lı ber germ bıke  
Hın pır caran  
Jı bo bê tarê n jıyanê  
Me nedin ber lê mıştê n xwe  
Gereke em hê linê xwe  
Dı nav pikanda durustkım.

Giyan!  
Kelê n bir anına dı serhev werdıbin,  
Bı agırı neditinê dıpirpıtım,  
Bıla grınê Viyanê bılınd bıbe,  
Jı mınra baştırın denge,  
Nermendgê Gulistanêye;  
Bıla lı ber kelyaskê \*rabım şevınê,  
Bê zar nabım,  
Ezê jê ra bılorinım  
Çı zanım jı goraniya,

Ezê jê ra bılorinım  
Çı zanım jı Çırok û mejvemê n vinê;  
Bıla kê mxewbım, bê darbım  
Şev û rojan,  
Çınkê şadı m bextewarım  
Bes bı wera

\*Kelyaska, gotmeke rûsi ye, erebane jı bo gerandinê zarokê n bıçûke



## " İSLAM LI WELATÊN ROJHELATA NÊZİK Û NAVÎN "

## PIRTÛKEKE NÛ

Tosinê Reşit

Li berevoka "İslam li welatê Rohhilata Nêzik û Navîn" (İslam v stranax Blijnêgo î Srêdnêgo Vostoka) gotara rojhilatnas O. Jîgalînayê bi sernivîsa "Rola İslamê li pêşvaçûna îdîalojiya tevgera kurdaye netewyê li İranê" çap bûye. Xudana gotarê bi kurtî derheqa olê kurda cûre - cûre dinivîse û paşê sergehînokarojê me li Kurdistana İranê disekine. Ew dide kivşê, wekî dema şorişa İranê li Kurdistanê ser binaxa olyê şer çêbûn.

Nîveka nîsana sala 1980'ê gava şerê navbera şorişvanê kurda û leşkerê hukumatê dîsa geşbû, Ayatolla Xomêynî gazî leşker û pasdara dikir, wekî Kurdistanê gişkî ji "kurdê bêxwedê" paqjîkin. Serokê kurdayî olyê Şêx Husêynî konstîtûsya zagona bingehîn İranêye nu rexne dikir, ya "ne bersiva xastinê kurdaye netewî, ne jî yê olî neda".

Pey avîtina rêjîma şahra, bi taybetî dema bizava demokratîyêye giştî li Kurdistanê sala 1979'ê kevneperestara li hev hat çend ciya şerê navbera sunya û şûya çêkin, çawa bo nimûne li Nexedê.

Li Kurdistana İranê, zordara ra li hev hatîye gelê kurd nava taryê û nexwendîtiyêda bihêlin, lema jî bandûra şêxa û alîma hêmezine.

Dema şorişa İranê, ya ku binbandûra ola İslamîyê kivşbû, li Kurdistanê jî çend nonerê olyêye kurd derketine meydanê.

Nava piraniya kurdan da nav dengê serokê meçîta Mahabadê Şêx Îzêdîn Husêynî bilinde. Ewî salê 50-î dest bi xebata sîyasî kirye, dema xebata dijî împêralîzma inglîz. Sala 1951'ê ew bû alîgirê Mosadîk. Ji sala 1961-ê îmamê Muhabadêye, yanê serokê kurdê sunîyî olyê. Şêx Husêynî yek ji xebatkarê dijî rêjîma şahî lapî mêranî bû. Ew bîr û baweriyê xweye sîyasî va nêzikî Ayatolle Teleganî bû.

Şêx Husêynî, çawa nonerê perê ruhanya misilmanîyêye demokratîyêye çep, dixwaze wekî problemê civakî û aborî bi cûrê demokratî bêne ronîkirinê, bona kara karkera, gundiya û bûrjuvayê biçûk. Ew jî aliyê piraniya rûniştvanê kurd da hatîye naskirinê çawa serokê kurdayî ruhanîyêyî tenê û çawa nonerê sereke li gotûbêjê tevî hukumatê. Bi taybetîne bîr û baweriyê Husêynî ye olyê. Şirokirina wîye İslamê bi piştgirtina çîned bindest tê cudabûnê û wêda êpêce êlê mên-tê dijî bûrjûvaniyê hene. Şêx Husêynî ne alîgirê rêstavrasya İslamê ye. Bi gotina wî ola İslamîyê gerekê seva pêşveçûna pevgirêdanê nû neve hasêgeh, lê hela gerekê binaxê îdolojîyê bide wan. Ser bîr û baweriyê Husêynî îdeayê marksîyê bandûra xwe hîştine.

Nava karkerê Mahabadê û tebeqê Kurdistanê prolêtaryê alîgirê Husêynî pirin. Di pîrsa rîya

pêşdaçûna Kurdistana İranê Husêynî aliyê rîya sosiyaltizmê digre: "Ez sîstema sosiyaltizmê hê bilind digrim, - ew dibêje - ji ber ku ew bo gişka mafê jînê û kar dide".

Li jîna kurdê sunîye olî - sîyasî da Şêx Ahmed Mofîzade roleke mezin diltze, alîgirê Kîjanî bi piranî li Senendecê ne. Pîrsê civakî û sîyasîda ew bi xastinê xweye kompromîsîva dîhare. Afkîda ew alîgirê Xomêynîye di dereca sazîkirina dewleta têokratîyêda. Ewî çend cara gotîye, wekî kirinê wî seva hezkirina Komara İranêye, İslamîyêye. Ew alîgirê slogana: "Ne Rojava, ne Rojhilat, tenê İslame". Bi van kirnê xwe ew gihiştê wê yekê, wekî hukumatê ew nas kir çawa serokê kurdayî sîyasî û olyêyî tenê. Afkî dinêva ew çawa piştovanê avtonomiya kurda pêşda tê û bi vê pîrsê çend cara rastî Xomêynî hatîye. Bi bawerîya Mofîzade kevneperest û hêzêd împêralîstîyê ne wekî nahêlin pîrsa kurda İranêda ronî be. Mofîzade dernakeve dijî alîgirê Xomêynî ew dixwaze wana ra ziman bivîne. Vê derecêda bi bîr û baweriyê xweye sîyasî nêzikî Mofîzadeye serokekî kurdayî olyêyî mayîn, Ayatolla Heyderî, serokê kurdê başûra Kurdistana İranê. Nav kurdê şîî, bi taybetî li navçê Îlamê û Kêrmanşahê alîgirê Xomêynî jî hene. Ser bîr û bawerîya wana bandûra netewperestîya misilmanîyê û panîslamîzmê heye. Pîrsê hundurê welêt da, bi taybetî problema kurdaye netewiyêda, ewana dijî tevgera demokratîyêne. Ewana opozîsiya demokratîyêye çep çawa ya "dijîslamîyê", "dijîşorişiyê" divînin.

Bi vî teherî, taybetîya gehîno-ka olyê li Kurdistana İranê ew hebûna olêd cîhanê bi sêktayêd cûre - cûre. Eva faktora ser tevgera kurdaye netewiyê bandûreke xirab dihêle, ji ber ku dive menya dufiretyê û perçebûnê, dive hasêgeh seva yekîti û hevgerîna hêzêd kurdaye netewiyê - niştîmanperweriyê.



Mattio Sza



## BIJÎ YEKÊ GÛLANÊ

Îsal disa gelê me li her çar perçeyê Kurdistanê da, 1 ê Gûlanê dî bin şertê dijwar da piroz dike.

Li Kurdistanê Îranê ev nêzi pênc salaye ku gelê kurd, jî bona girtina mafê xwe yê demokratik û insani tekoşinek bê hempa dîde. Dî vi şeri de xwinrijê Humeyni mafê gelê kurd nade û her roj bî tank, bî top û bî balafiran ve êrişên gelek dijwar û hov dibe ser gelê me. Lê belê gelê me li hember van êrişên kurdîyê Humeyni serê xwe xwar nake û bî çehremani welatê xwe diparêze. Îro rewş çiqê dijwar be jî, serkevtin dîr an nêzik yê gelê me be.

Li Kurdistanê Îraqê rewş jî ya Îranê xerabtire. Li vê perçê Kurdistanê jî gelê me jî serê salan ve li dîr kurdîyê Saddam tekoşinê dîde û li serê çiyayê Kurdistanê jî bona azadiya xwe wek lihiye xwina xwe direyijine. Dî vi şeri de hatani iro gelê me bî hezaran ve şehid daye. Hemû kolan û çiyayên Kurdistanê jî xwina şehidan sor bûye.

Diktatoriya Saddam jî bona ku vê tekoşinê bîde sekmandin, bî hemû hêzên xwe ve êriş dibe ser gelê me. Bî balafiran gund û bajarên Kurdistanê bombardûman dike. Lê gelê me li hember hemû êrişan tekoşina xwe dîde domandin. Erişê diktatoriya Saddam çiqas dijwar dibe bila bibe, wê serkevtin ya gelê me be.

Li Kurdistanê Sûriyê rewş ne wek perçên dîr be jî, lê cardin gelê me jî gelek mafên xwe yê demokratik û siyasi bê parin.

Ev sê salî zêtir e ku li zindanên Tirkîyê bî deh hezaran girtiyên siyasi dî bin zilmeki mezîn dane. Firsend nadin wan ku ew kitêb û rojname bixwinin, merivên xwe û avûkatên xwe bibinin. Yek şikil kincên mahkûnan li wan dîkin. Li zindanê rewş pis û xirabe. Xwarîna ku didin wan kême û nayê xwarin, nahêlin girti hewa paqj bistinin, lêdan û tade karê rojane ye. Bona vê yekê temamiya van insanan jî nuha ve nexweş û seqet ketiye. Jî wan bî sêda kes jiyana xwe hinda kir. Ew her roj her texlit heqaretê dibinin. Sazûmana faşist, bona ku bî aliyê bir û aliyê bedeni dawîya wan bine, çî jî desta tê dike.

Li van rojana ku li Tirkîyê behsa "derbasbûna demokrasiyê" ewqas tê kîrîn, li zindanan rewş çêtir nebû. her çû xirabtir bû û nayê kîşandin. Bona ve yekê li çar alî welat girtiyên siyasi dî ber xwe didin; li zindana rewşeki mirovi dîxwazin; dibênin bila dawîya zilmê û lêdanê bê, bîkarîbî merivên xwe bibinin û xwe li hember mahkemê bî parêzin. Lê bersiva sazûmana faşist harkirina zordestiyê girankirina tade û lêdanê bû. Ber vê yekê li zindana Diyarbekirê, 11 welatparêzên kurd jiyana xwe wînda kîrin. Li zindana Mamakê li Anqerê gelek girti dî rewşa mirinê da ne. Jî û merên girtiyên, dê- bav û merivên wan, bî cilê wani xwini çûn serî li derê hukumetê xistin, lê jî wê hatin dîrxistin. Ew jî pîr caran jî girtinê, jî lêdanê nesibê xwe distinin.

Dî rewşeki wîhanda welatparêz û şoreşgerên kurd yê li dervayî welat dî 1 ê Gûlanê de li dijî diktatoriya faşist û hemû zilm û zordestiya li ser miletê kurd hêzê xwe yek bikin!

BIJÎ TEKOŞINA ME A NETEWÎ  
BIJÎ 1 GÛLAN CEJNA KARKERÊN HEMÎ WELATAN!

FEDERASYONA KOMELÊN  
KURDISTAN LI SWÊD